

Ji edîtor (Ji bo hêjmara sêyemîn)

Ji nûpelyê bi naverokek têr û tije merhaba xwendevanên hêja.

Tov hene zû şîn dibin, zû dibişkivin û zû zîl didin; tov jî hene ji bo ku qalikê xwe biteqînin wext divê sebir divê û hewl divê... Nûpelda, tovek e jiyanî, çandî û edebî ye. Weke li ser berga wê jî hatiye nivîsandin nûpelda, bêndereke çandê ye... Nûpelda tovek e dixwaze ku qalikê bişkînê û serê xwe bi biharek e dilaram re derxîne û berjor û ber bi rojê bilind bike. Di demek e bêhnbihar de, dixwaze li ser dil û eqlan bihnek e biharî bireşîne û tovek e jiyanî biçîne...

...

Weke her toximekê Nûpelda jî dixwaze û pêşniyaziyê dike ku mezin bibe, bipişkive, şax û fêkiyan bide... Ji bo vî karî jî malûme, av, ax, hewa, lênêrîn û xebat lazimin. Bi vî awayî Nûpelda ji xwendevan û nivîsakarên xwe palpiştiyê dixwaze... Lewra temendirêjî bi başlênihêrtin, bi tenduristî jiyîn û bi lixwenihêrtinek e xurt ve pihêt girêdayiyê.

Ji bo naveroka kovarê bibe dewlemend pênûsên xurt divên. Ji bo pênûsên xurt werin perwerdekirin jî berdewama kovarê divê.

Nûpelda li cihekî avî û bibereket dest bi weşana xwe ya çandî kir... Lewra em dizanin ku li qeraxa gola wanê, bi tameke şêrîn bi bihneke biharî serê xwe ji bin berfa zozana derxist.

.....

Ji nû ve bihar e. Bihar jiyaneke pir bi nexşe. Bihar, nûvejîna kulîlk û binevşa ye. Weke listika zarokan bi ken û bi aram e bihar. Bihar, hestan jî ji nû ve difirîne. Bihar, tovên bêhêvîtiyan dihelîne û ji nû ve hîviyan diçîne di nava dil û mêjiyên merivan de. Bawerî xwe nû dike, rûkenî xwe nû dike, pêşeroj xwe ji bo nûkirinê amade dike, kelecoşa rojê ji nû ve hiltê... Hêviya me jî heye ku di vî warê kesertêr de hesret û nalîn ji nû ve venegerin, qut bibin û ji kokê de rabin. Biharek e bi rastî û dirûtiyê dûr be. Lehî û tofan li do bimînin. Êvar û şev xwe ji bîrbikin. Bira ji birayan re behsa qencî û xweşiya biharê bikin.

...

Di warê edebiyatê mijarin cûr bi cûr hatine amadekirin di vê hêjmarê de. Bi bîranîn, çand, çîrok, danasîna pirtûkan, biwêj, helbest, huner, jînenîgarî, pexşan, lêkolîn û wergeran dîsa bi haêjmarek e têr tije em bi werene.

Em hêvîdar in ku me hejmareke bi rêk û pêk, bi dilê we û dewlemend gihandiye ber destê we.

Heta hêjmarek e din bimînin di xêr û xweşiyê ...

M. Zahir ERTEKİN

navnîşan

Hastane cad. Donat İş Merkezi. Giriş kat.
No: 6 Beşyol / VAN
Tel: (0 432) 215 80 60
Fax: (0 432) 215 11 62
kovaranupelda@gmail.com